

Em kitêbem çon nûsî?

Berhemî: Mihemedemîn Zekî beg (1880-1948)

Le kitêbî: *Xulaseyekî tarîxî kurd û Kurdistan*

Le dûway eme ke le cêgey te`bîrî umûmîy "usmanî", lefzî "turk" û "toranî" le turkiyada bawî send, be tebîet wekû efiradî mîlletekanî tir, minîş le naw ew komeleda xîretî xom çaktir hîs kird û xirûrî qewmî, mecbûrî kirdim ke le hemû firsetêkda em hîssey xom îzhar bikem, belam derheq be esil û te`rîxî qewmekem hîçim neezanî, çunke ta ew weqte ne le mekatbda fikrêkî waman dirabûye û ne le dûwayîşda zerûretî tedqîqî te`rîxî kurdîman dîbû û kelîmey camî`ey "usmanî", e`sabî qewmîyey hemûmanî ta dereceyek xaw kirdibûwewe, barha em sualem le xom ekird: qewmî kurd le çi neteweyeke? Çî be ser hatûwe? Belam nemetwanî cewabêkî başî bo bidozimewe; be na`îlacî le çend gewreyekî kurdîm pirsî, heta lewane dûwanîşyan le mamostakanî te`rîx bûn, yekêkiyan esilî kurdî be rîwayetêkî muşeweş birdewe ser Kurd-î kurî Emroy Qehtanî; ewî tirîşyan kirdîni be netewey dêwêk ke "Çasad"- yan pê gutûwe. Berastî em dû cewabe bêxêre zor sexletî dam û legel wîcdanî xomda qewl û birîm kird ke xom tedqîqî em muemmaya bikem. Zatî bûnim le Estamolda firsetêkî baş bû, weqtî bêîşîy xom bo em tedqîqate dana û le îbitîday 1326 -î romîyewe desim kird be ziyaretî kitêbixanekanî Estamol. Firsetî em xidmetem kem bû, çunke hemû salêk şeş hewt mang legel qomîsyonî hidûd le derewe xerîk ebûm, lem firsete keme zorim îstîfade kird û ta ewaxîrî salî 1328 -î romî, çend sed eserêkim mutala kird û notêkî zorim girt. Bextûtali` le 1329 -da be wezîfeyekî resimî geyandimye Ewrûpa; le Alimanya û Feranse-da zor kitêbixane û mûzem ziyaret kird û zor asarî nadîrem çaw pêkewt û notêkî zorim ko kirdewe û derheq be kurdayetî, sî çil kitêbêkî başî musteşîrîqînîşim kirî, belam le dûway geraneweman zorî pê neçû şerî gewre desî pêkird û wezîfe, em tedqîqatey pê dûwa xistim.

Le dûway şerî gewre, ke çûmewe Estamol, serlenwê desim pêkird, kitêbe tazekanim baş mutala kird, notekanim rêk xist û desim kird be nûsîn û dûsed lapereyekim hazir kird. Ewendey pê neçû le salî 1335-î romî (1919-î mîladî) û le cejinî qurbanda tûşî musîbetêkî gewre bûm, le weqtêkda ke le malewe nebûm, gerekekeman agirî tê berbû û xanûwekey minîş lew naweda sûta û hîçiman bo derneçû. Be tebîet rencî pênc şeş salim le des çû, ne note ma û ne kitêb; em musîbete gewreye berastî zor me`yûsî kirdim û çar naçar wazim lê hêna.

Le dûway em me`yûsîye, be de sal, ye`nî le 1929 -î mîladîda rojêk le kitêbixaney "*mecilîsî nûwab*" -da "Enşqlopedyay Îslam" im çaw pêkewt û bo mutalakirdin be emanet werimgirt. Temaşam kird em esere nayab û tazeye, ke le 1905 -da le teref heyetêkî mutexesîsewe desî pêkirawe û hêştaw tewaw nebûwe, le cildî dûwemîda behsêkî mexsûsî kurdî tiyaye le teref musteşîrîq û alimêkî zor benawbangewe ke "Fon Mînoriskî" [Vladimir Minorsky] -ye, nûsirawe. Be şewqêkî ziyadewe dû sê car xwêndimewe. Em mutalaye meylî konî taze kirdimewe û serlenwê qerarim da ke le ser ew esase, "*Xulaseyekî te`rîxî kurd û Kurdistan*" binûsim.

Le pêş hemû şitêkda hênam ew ebihasey ke legel kurd û Kurdistan -da munasebetî bû, hemûm tercume kird; le paşda, be giwêrey bîbiloxirafîyekey, ew eseraney ke îşaretî bo kirdibû, hewlim bo peyakirdinî da, be`zêkim des kewt û be`zê eserî tazeşim peya kird. Be`zê le dostanîş le xisûsî peyakirdinî be`zê kutubewe yarîyekî zoryan dam û le îrşad û efkarî alîmaney mudîrî "*Daîrey asarî Êraq*" ke "*Sir Sidney Smith*" bû, zorim îstîfade kird. Esere nayabekey xoy legel be`zê asarî tirda bo nardim û mutale`eyekî başîşî derheq be Kurdistan bo nûsîm.

Le dûway kokirdinewey em asare, ke nawekanyanim le nîhayetî em cildeda nûsîwe, le îbitîday salî 1930 -da desim kird be seîkirdin. Nebûnî wezîfey resimîye-şim firsetêkî baş bû û be se`yekî berdeyam nizîkî salêk xerîk bûm. Lem muddeteda em cilde ke zubdeyekî "*Te`rîxî kurd û Kurdistan*" -e, legel beşêkî cildî dûwem, ke "*Te`rîxî hikûmatî kurd*" -e, "*Te`rîxî wilatî Silêmanî*" û beşêkî kitêbî "*Piyawe gewrekanî kurd*" pê geyenira.

Be`zê le dostan wîstyan ke em kîtabane ya be erebî ya be turkî binûsim; belam berastî lam munasîb nebû ke te`rîxî kurd û Kurdistan le teref kurdêkewe le hemûy ziyatir bo kurde be zimanêkî xeyre kurdî binûsirê. Mela Îdirîsî Bitlîsî, kitêbî "*Heşt beheşt*" -î be farsî bo sultan Bayezîd nûsî, zererî nebû, çunke te`rîxêkî usmanî bû, belam be eqîdey min Şerefhanî Bitlîsî neebû "*Şerefname*" ke te`rîxêkî kurde, be farsî binûsê. Xulase bem qena`ete, be kurdî nûsîm belam lem nûsîneda dû şitim be esas dana:

1. Kelfîmatî kurdîm wekû çon ebêjrê, wa nûsî, belam îmilay kelfîmatî erebî û farsîm têk neda, çunke ewelen heqim nebû, sanîyen, renga serîş le xwêndewaran têk bida.
2. Lebatî jêrî îzafe "î" û le cêgey ser "e" û le batî bor "u" -im dana, nemwîst herfî ziyade dabinê. Waqî`en telefuzî "L" û "R" û "U" le zibanî kurdîda çend new`êke, belam emane le mewqî`î xoyda be serincdan feriq ekirê.

Min qet îddî`ay ewe nakem ke em kitêbe te`rîxêkî tewaw û bêqsûrî kurde, belkû be eksî eme, elêm qşûrî zore; legel emeda ke netîcey tedqîqî dûsed û penca cildêk asarî îngilîzî û feransîzî û alimanî û erebî û turkî û farsîye, dîsanewe nuqsane û tenya esasêke bo lawan û xwêndewaranî kurd û etwanin be şêneyî îkmalî biken. Bo saxkirdinewey te`rîxî qedîmî kurd, le hemûy ziyatir hewilim da û çiwar car em behsem serlenwê nûsî û be dereceyek, be yarmetîy asarî taze û beqîmet saxim kirdewe û eger be tewawî û bebê şubihe em behse sax nekirabêtewe wa ezanim xetay min nîye, çunke asar û wesafîqî êsta her ewende musa`edey kird. Belam umêdim heye ke mesa`iy gerim û berdeyamî heyetekanî asarî qedîme, le musteqbelêkî nizîkda em behse ziyatir tenwîr eka.

Le beşî wiqû`atî te`rîxîyey kurd û Kurdistan -îşda hadîsatêkî merbût û muntezem nabînrê. Sebebî emeş, nebûnî mebahîsêkî mexsûse derheq be qewmî kurd. Asarî şerqîye û xerbîye, basî kurd û maceray be`zê eqsam, ya piyawe gewrekanî kurdyan tenya be munasebetî be`zê hadîsatewe kirdûwe û em behsaneş we nîye yek le dûway yek bê; exlebiyan nuqsan û piçirpiçire. Meselen "*Alkamil*" basî "*Ce`fer*"nawêkî gewrey kurdî bo eka, ke dû def`e leşkirî xelîfey Ebbasî "*el-Mu`tesem*" -î le şaxanî "*Dasnî*" -da şikandûwe, belam derheq be esil û fesilî û serguzîştay, hîç xeberêk nada.

Îbinî Mîskweyh le kîtabî *“Tecarib al-Umem”* -da basî *“Ehmed kurî Zehak”* -î kurd eka, ke le naw leşkirî mîsirda û le qomanday *“Îbin Semsam”* -da bûwe û le weqtêkda ke leşkirî mîsir beramber be rom le Sûrye -da şikawe, em qehremane be tenya sware, helîkutawete ser serdarî rom û kuştûyetî û bote sebebî xelebey leşkirî mîsir (381 -î hîcrî), belam derheq be esilî û dûwayî heyatî em qehremane me`lûmatêk nada.

Xulase, le asarî xerbîye û şerqîyeda derheq be tarîxî kurd me`lûmatêkî rêkûpêk nîye, yaxud bo min nedozirayewe û bedûr nîye ke eger dewam le ser tedqîqat bikirê, em nuqsane kemê zorê le nawa helgîrê û em xidmeteş wezîfey lawanî îmiro û sbeynêye. Lem xisûsewe zor tikayan lê ekem ke wekû be`zê muherrîrînî kurdî dûwênê û îmiro, le tarîx nûsînda tabî`î hîs û xeyal nebin, le xoyanewe hîç helnebestin û hadîsatî tarîxîye negorin. Bo ew behsaney ke eynûsin, wesîqeyekî mu`teber û me`rûf nîşan biden; eger wa neken, rencyan be zayî` eçê, nûsînekeyan qîmetêkî îlimîyey nabê û le layekî tirîşewe xoyan û qewmekeşyan tiro eken. Min be giwêrey tedqîqat û tetebu`atî xom, be tewawî têgeyiştûm ke qewmî kurd û tarîxekey, hîç muhtacî em new`e şitane nîye, mefaxirî tarîxîyey zore, ebê boy bigerêyn û bîdozînewe, wezîfey pêgeyiştûwanî kurd emeye.

Bo tebirîk, faîdey ewel teb`î kurdîy em cild (cizim) em bo *“Yaney serkewtin”* hedye kird, eger em *“Cem`yetî ilmîyey kurd”* -î kemtal`e, leme faîdeyekî çing bikewê, zor memnûn ebim.

Înşaella le dûway eme cildî dûwem û *“Te`rîxî wilatî Silêmanî”* û kitêbî *“Piyawe gewrekanî kurd”*, yek le dûway yek le çap edirê û emane ebine sebebî teşwîqî qelembedesitan û pêgeyiştûwanî kurd.

Mihemedemîn Zekî, wezîrî pêşûy hikûmetî Êraq

15 -î mart -î 1931

Serçawe: saytî Vejîn

<https://books.vejın.net/ck/text/28161>